Osmanê Dadeliyê çû ser dolovaniya xwe

Osman Hacî Silêman, di sala 1946 an de, li gundê Dadeliyê, herêma Kobaiyê, ji dayîk dibe.Di sala 1991 an de, ji hêla dilxwazên P.K.K ve, li gora helbijartinên encûmana Sûriyê dibe endamê Perlemanê. Osman , di nav êl û eşîrên Kobaniyê de, xwedî rûmet bû. Osman sê caran (1995-2002-2005) hatiye girtin û berdan.Û di 27-11-2007 an de, careke din tê girtin. Di 22-01-2008 an de, ji hêla esayêşan ve, bi dizî û di bin navekî ne nas de- **Ehmed El-elî-** dike ve nexwaşxana El-kindî. Piştî hêvî jê tê birîn, xwediyan agahdardikin û wî berdidin. Xwedî wî di nexwaşxana El-eşrefiyê û Martînî de derman dikin. Di şeva 19- 2-2008 an, di nexwaşxana Martînî de, jiyana xwe ji dest da û di 20 an de, bi beşdariya bi hezaran xwedî û berketiyên Osmên li gundê Dadeliyê tê veşartin.

Bi navê komît û xwendevanên Newrozê, em serê xwedî û berketiyên wî saxdikin.

Komcivînên Rêxistinî

Ji bo pêşxistina rewşa rêxistinî ya partiya me, komîta herêmê ya taxa Eşrefiyê, Çend şevên rêxistinî li dar xist. Hevalan, tiliyên xwe danîn ser kêmkasî û newaşyiên heyî û taybet, Wek tengasiya rewşa aborî, civakî û siyasî ya gelê Sûriyê û bi gotin û pêşinyarên xwe hevalan ew şev têrkirin û xemilandin

Du xewndekar Hatin Giritn

Di 21-2-2008 an de , li zanîgeha Heleb, du xewndekar(Cîgerxwîn Mile Ehmed Mîkanîk sal 2 û Ehmed Yûsif-Edeb-Erebî sal3 ji hêla hêzên ewlekariyê ve hatin girtin.Û di 25 an de Cîger tête berdan û yê din jî hê girtî ye. Bi navê komîta rêvebir ya weşana Newrozê, van ton girtinan şermezar dikin û doza berdana yê girtî dikin.

Efrîn ji Dêrê vedixwe

Li 23.2.2008 an , roja Şemiyê , li lîstgeha Hemedaniyê li Heleb , tîpa Efrînê ya werzişê bi Ya Fitiwê re raberîdaneke fotbolê (gokê) lîst . Di encam de , Efrînê(3 bi 2) Golan ji Dêrê vexwar

PÎROZ BE

Li vê dawiyê, Tîpa werzêşê ya Cîhad a taxa Eşrefiyê Heleb, bi panzde giropên lîstgoyê, lîstin. Li encama lîstikê, herdu girop, El-cîhad û El-reca man. Di navbera wan de, bi beşdariya komek ji xortan, tîpa El-cîhad bi encama 3/2 golan bi ser ket.

Li dawiyê Werzêş û cansivikî armanca xortan e û serkeftin ji tîpa El-cîhad re.

Pîrozbahî

Bi hatina cejna jinan û Newrozê, em baxek gulên rengîn diyarî jin, dayîk , gelan û bi taybetî gelê xwe yê Kurd dikin.

.